3. Die Unterstützung unserer Vereinsziele liegt voll im Interesse vieler namenhafter Persönlichkeiten. Zu diesen Personen zählt auch der Innenminister von Nordrhein-Westfalen, Herr Dr. Herbert Schnoor, der die Schutzbedürftigkeit und Schutzwürdigkeit unserer Religion und Kultur erkannte. "Sicher ist nur eins, daß nach meinem Eindruck Religion und Kultur eines alten Volkes aussterben. Und das ist das, was mich besonders traurig macht." (Zitat vom 10.11.1989 einem Kongress in Hannover). Aber auch oldenburger Persönlichkeiten und Institutionen begrüßen unsere Initiative.

4. Dieser Antrag wird von den hier lebenden 600 Yeziden getragen. Diese Yeziden fühlen sich als Bürger dieser Stadt.

Wir wären Ihnen sehr dankbar, wenn Sie unseren Antragsbegehren stattgeben. Für weitere Fragen und Gespräche stehen wir Ihnen gerne zur Verfügung. Als Anlage übersenden wir Ihnen noch Informationen über unseren Verein. Mit freundlichen Grüßen,

M i t t e i l u n g

Endlich eine Hoffnung für die Ezîdî in Deutschland

Liebe Ezîdî,

am Sonntag, dem 23. April 1994 kamen verschiedene Vertreter der in Deutschland bestehenden Ezîdî-Vereine in Berlin zusammen, um die Möglichkeiten zur Gründung eines einheitlichen Vereins oder einer Dachorganisation zu erörtern.

An der Sitzung haben folgende Vereine teilgenommen, die alle Ezîdîs, die an der Erhaltung unserer ehrwürdigen Tradition interessiert sind, aufrufen, zur Erhaltung unserer gefährdeten Gemeinschaft beizutragen:

1. Verein für die Kultur und Religion der Ezîdî , Oldenburg
2. Union der zarathustrischen Eziden , Emmerich
3. Religionszentrum der Eziden / Zarathustrier , Bonn
4. Lalisch-Zentrum für Kultur und Soziales, Berlin
5. Der Heilige Ezid-Verein, Leer
6. Der Ezîdî-Verein, Bremen
7. Der Ezîdî-Verein, Celle
8. Der Ezîdî-Verein, Bielefeld (Verein in Gründung)
9. Lalisch-Zentrum für Kultur und Soziales, Hannover.

Die Ergebnisse dieses, von Toleranz und starken Willen geprägten Treffens übertrafen die darin gesetzten Hoffnungen.

Wir können nicht behaupten, daß wir die vielen anstehenden Probleme der Ezîdîs lösen können, haben aber Zuversicht, daß wir die Hauptprobleme bewältigen können.

Mit viel Verantwortungsgefühl und einer breiten Akzeptanz konnten die Teilnehmer, die ohnehin geringen Differenzen beseitigen und viele Stolpersteine auf dem Weg der Einigung aus dem Weg räumen. Alle Teilnehmer hoben die historische Bedeutung hervor und brachten ihre Hoffnung zum Ausdruck, daß dieses Treffen als Grundlage der weiteren Zusammenarbeit dienen wird.

Um dem Anliegen Nachdruck zu verleihen kamen alle Vertreter der teilnehmenden Vereine zu Wort und erklärten ihre Standpunkte zu dieser Einheit.

Einstimmig und wohlwollend kamen die Teilnehmer zu dem Schluß, daß die Einheit unter anderem deshalb notwendig sei, weil wir uns nur so in der Diaspora behaupten können und die Tradition der Vorväter fortgesetzt werden kann.

Die Sitzung hat beschlossen, den Prozeß der Einheit schneller voranzutreiben.

Dieser Beschluß trug vor Ort die ersten Früchte: Es wurde ein Komitee gegründet, dessen Aufgabe es ist, einen Kongreß (Generalversammlung) zustande zu bringen und die dafür notwendigen Vorbereitungen zu treffen, sowie noch offene Fragen zu klären.

Wir hoffen, daß es zu diesem überregionalem Treffen bald kommen wird.

Erklärung

Wir werden, in Zukunft alles daran setzen, um diese Einheit zum Erfolg zu führen.

Dies allein reicht aber nicht aus, um das Überleben unserer kleinen Kultur- und Glaubensgemeinschaft zu sichern. Daher ergeht an Euch alle, liebe Ezîdîs, folgender

Appell:

Gebt jede Form des Untergangs-Pessimismus auf!

Wir sind zwar eine Minderheit und es ist schwierig, sich gegen alle zerstörerischen Einflüsse von außen zu behaupten.

Denkt daran, daß wir uns nicht an unserer Zahl sondern an unseren Werten messen lassen wollen ! Sie zu erhalten ist jedermanns Aufgabe.

Helft mit bei der Bewältigung der Probleme!

Unterstützt die Bemühungen Eures neu entstehenden êzîdîschen Dachverbandes zur Stärkung der Interessenvertretung hier in Deutschland und in der fernen Heimat !

Damit auch für die jüngere Generation unsere 4000 Jahre alte Religion, unsere tiefwurzelnende Kultur und Tradition nicht verloren geht.

-- Die Ezîdî-Vereine in Deutschland --
Berlin, den 23. April 1994

Protokoll

Wir yezidische Jugendliche haben uns am 11.03.1994 zur ersten yezidischen Jugendveranstaltung zusammengetroffen. Zweck der Veranstaltung, die vom Kulturforum der yezidischen Glaubensgemeinschaft initiiert wurde, war daß, wir uns in einem offenen Gespräch über unsere Einstellung zur Religion und Kultur unterhalten.

Hierbei sind wir zu folgenden Ergebnissen gekommen:

1. Wir verstehen uns als die zukünftigen Träger der yezidischen Gesellschaft und wollen gemeinsam Hand in Hand ein yezidisches Leben auf den Grundsätzen unserer Religion führen
2. Probleme, die aus unserem Aufwachsen in zwei Kulturen entstehen, wollen wir gemeinsam lösen.
3. Um den Kontakt unter uns Jugendlichen zu fördern, werden wir uns zu Gruppen bilden, in denen wir unter anderem gemeinsam unsere Freizeit gestalten wollen.
4. Der Verein wird uns im Rahmen seiner Jugendarbeit unterstützen. Neben organisatorischen Hilfestellungen wird er unsere Interessen bei Behörden und anderen Institutionen vertreten.
5. Wir fordern alle Kräfte unsrer yezidischen Gesellschaft auf uns bei unserem neuen Weg zu unterstützen.
6. Wir, die hier anwesenden und unterzeichnenden Jugendlichen verpflichten uns zur gegenseitigen Solidarität und wollen mit dieser Veranstaltung ein Zeichen für ein neues yezidisches Bewußtsein setzen.

Ismet Tagay
 Sahap Evim
 Errol yurt, Deum
 Mehmet Yeriya
 Btk Deymansan
 Metik ATALAY
 Lehm Atalay
 Tarik Abbas
 Glakan Taper.
 Sahin Civlek

Civîna Ciwanin Êzîdiya li Oldenburg'ê

Civîna Ciwanin Êzîdiya ya yekemîn de Keç û Xortan ji Dîne Êzîdîre gotin erê!

Oldenburg. Li Oldenburg roja 13 Adarê 1994'a cara yekemîn keç û xortin Êzîdiya civiyan. Komela Çande û Dîne Êzîdiya ya Oldenburg'ê bangî hemû Keç û Xortin Êzîdîyê li Oldenburg'ê kiribû. Armanca civînê ewbu ku Ciwan li ser pîrsa Kultur, Dîn û rewsa xwe xebêrdin, bi hevû dinre bişewirin. 53 Keç û Xortin Êmrê wan di navbera 15-20 salande bêsdarî civînê bibun. Civîn li Kulturzentrum Rennplatz Oldenburg'ê hatibû sazîkin.

Di destpeka civînê de Endamen Komîta Serkarî peyivîn.

Ew dê xebêrdanên xwede pîranî li ser kar û bar, Armançên Komelan sekînin Telim Tolan (serokê Komela Çande û Dîne Êzîdî li Oldenburg 22) Iskender Evin (22) û Cevdet Yanc (22) di gotinê kû : "Ev Komela ji bo Keç û Xortin me hatiye avakirin. Emê wek Komelekê giraniya xwe deynin, ser xebata bi Ciwananre, em dixwazin we nezîkî Çanda Dîne xwe bikin. Em dixwazin li ser daxwazî û pêsnîyariyên we bi sekînin, me lewma jî bangî we hemûya kirîye. Armanca me ewe ku em hevûdin nasbikin, li ser kar û barê we em bi hev re bi sekînin."

Di destpeka civînê de bê dengiyek hebû, gelek Ciwanan şerm dikirin bipeyîvîn, ji gelekare xebêrdana di nava civatê de ne rehet bû. Lê ev zû hate guhartin û dîre mîqateyêke zaf bi heyecan çêbû. Xwiyabû ku Ciwan dixwazin gelek tîsta bi bejin, di dilê wande pîr gazin hebûn û dixwastin gazînen xwe di vê Civînê de bînin ser zîman. Gelek Ciwanan di axaftinên xwede li ser asteng (problem) û kemasiyê di nava Civîna mede di sekînin û rexne li ser wan tîştan digirtin.

Hinek Ciwanan weha di gotin: "Bav û Dayîken me rewsa jiyana me baş fahm nakin. Ji wan werkirî ku em li hemberî Dîne xwene û em ji Dîne xwe heznakin. Yanî gelek tîsta ne rast di bînin. Wexta henek tîst ne bi dilê wanbe hengê dibejin :Zaroken me ji rîya Dîne xwe derketine. Le bi rasti ne weke wane. Mesela ku me ji Dîne xwe hez nekiribûna, emê îro li virê ne amede buna. Bav û Dayîken me bi rastî ji me baş fahm nakin, lewma jî problemê me nasnakin ". Ciwanekî wesa digot: "Ez dizanim ez Êzîdî me, lê bawerîya me û tarîxa Dîne me çîye? Ez nizanim". Dû vê gotinere

Komîta serkarî pêsnîyar anî got ku: "Em karin Semînera li ser Dîrok û rêza dîne Êzîdiya pêkbînin". Ciwanan ev pêsnîyarî zaf maqûl dîtin û gelekî kêfxwes bun. Ji xeynî van gotinan pêsnîyarên dirûst jî hebun.

"Em zaf baş di bînin ku Komela Çande û Dîne Êzîdiya hatiye avakirin. Em dixwazin çiyekî kufs bikin ku em karibin temî li bicivîn û gelek xebatan bihev re bikin". Gelek Ciwanan di axaftinên xwede alaqederîya xwe li ser kulturê diyar dikirin. Mesela Leyla Akbaş û Garip Tolan digotin: "Em dixwazen Folklorê hînbivîn, em



Keç û Xortin Êzîdîyê

folklorê zaf baş di bînin. Em bi vê hêviyê tîştin nûh ji kultura xwe hîndibin".

Wexte Cahit û Adil gotin ku ew jî dikarin dê warê muzîkê de xebatekê bikin. Hemû Ciwanan ji wan Dîlok xwestin, civîn pîre pîre bû wek cejnêkê. Cahit û Adil dîlokin zaf xweş gotin. Ciwan pê zaf dilxwes bun. Ji bo avakirina koma Folklorê nezîkî 27 Ciwanan navê xwe nêvîsandin. Hinek ji Ciwanan pêsnîyarî ji bo avakirina taximekî Topê anîn, ev pêsnîyarî zaf baş bu, li dibê em karê xwe bi gav gav bikin. Kirina hemû karî bihev re zaf çêdibe. Di civîna Ciwanan bala xwe li ser Dîne Êzîdî û xebateke bi hev re diyar dikirin. Em wek endamên Komîta Serkarî, bi pêkanîna vê civînê zaf kef xwes bun. Dawiyê, protokola civînê hate nivîsandin û bi dengêkî bêlînd ji Ciwananre hat xwandin.

Ciwanin me Omîda pêşeroja Dîne mene!

Ümitlerimizi Tasiyan bizim Gençler

Yezidi Dinimizin geleceği, daha çok gençlerimizin Dinlerine olan Sevgi ve inanca bağlıdır. Bizim Yezidi Dinin temel direkleri gençlerimizdir. Dinimizi sadece gençlerin birliği ve onların bilinci kurar veya ilerletebilir. İşte bu yüzden de gençlerimizin Yezidi Dinine olan Alakası onların günlük sorunlarıyla ilgilenmek ve onlara her konuda sahip çıkmamız gerekir. Almanyada yaşayan gençlerimizin durumu nasıldır? Eger burda büyüyen gençlerimize Yezidi Dini hakkında bir soru sorarsak acaba ne gibi doğru bir cevap alırız. Gerçeği söylersek; ya hiç cevap almayız, yade çok az doğruyu bilen vardır. Bu demek değildir, gençlerimiz kendi Dini Gelenekleriyle ilgilenmiyorlar. Onların normal günlük yaşamlarına baktığımızda, gençler Kendi Kurt ulusal Örf ve Adetleriyle az çok ilgileniyorlar. Yani çoğuları Düğünlere gidiyor. Kendi Annadilini azde olsa konuşabiliyor. Fakat Kültürel ve Dini bilgileri çok azdır. Çünkü çokaz Aileler bu önemli Kültürel ve Dini Konular üzerinde kendi Gençleriyle konuşuyorlar Gençlere Dini Dualar eğitiyor veyede, Taus-i-Melek hakkında bilgi veriyor.

Tabi gençler, Aile terbiyesi içinde biraz Yezidi Dinin Örf ve Adetlerini öğrenmişler. Bu arada bir çok konuda de Dinimizde yasak ve haram olan bazı şeyleri düymüs veya öğrenmişler. Çakat bu yasak ve Haram olan şeyler ne için ve nendendir, tam manasıyla gençlere Açıklama yapılmıyor. Böylece gençlerde Dini ve Kültürel Konularda yanlış hatalar yapıyorlar. Tabi bu yasak olan kurallar Dinimiz dışarda ve içerde kuruyan temel prensiplerdir ve bunların olmaside gereklidir. Dinimizin esas prensipleri daima insan sevgisiyle savunmamız gerekir. Böylece Yezidi Dinin yayılması ve korunmasını istiyorsak ozaman bütün bu konularda Gençlerimizi aydınlatmamız lazımdır. Gençlerimizin öğrenme sansi vermeliyiz. Onlarla her konu üzerinde konuşmalı ve açıkça serbest tartışmalıyız. Gençlerimizin sorunlarına böyle yaklaşırsak, simdiye kadar bizi anlamayan ve Dini bilgisi az olan gençlerimizde bize yakınlık gösterirler. Gençlerin inancı ve Bilgisi artıkça bizimde toplumsal ve Dini birliğimiz gelişir. Bu açıklamaları yaptığımızda, Anne ve Babaları de Suçlamıyoruz. Çünkü biliyoruz Anne ve Babalar kendi ülkelerini terketme Kararı alırken onlar için kolayı bir karar olduğuna inanamıyoruz. Elbete birçok Diş kuvetlerden gelen zorluklardan kaçmak ve kendi geleceğini iyi düşünerek memleketlerini terketmişler. Yabancı bir ülkede tekrar Örf ve Adetlerini kurmak ve geliştirmek onlar içinde pek kolayı değildir. Her çeşit zorlukları göze olarak kendi gençlerin serbet yaşamaları için ellerinde gelen Fedekarlığı yapmışlar. Bizim için her zahmete katılan bu Anne ve Babalara saygımız sonsuzdur. Kurdistandan gelip Avrupa ülkelerinde yaşamak,

kendi Dinin, Topumasal birliğini ve Kültürünü kurmak kolayı değildir:

- a) Anne ve Babalar Kurdistandeyken, Yezidi Dinin öğretilmesinde ve Öğrenmesinde her nekad arluklarla Karşılaşıyorlarsaydide yine gençlerin Kendi inançlarını az çok öğreniyordu. Köyde herkes, birbirini taniyordu çoğu köylerde sadece yezidiler yalnız oturdukları içinde kendilerine karşıleli olarak yardımcı oluyorlardı ve Yezidi Dininin Örf ve Adetlerini, kendi Kültürünü kuruya biliyorlardı. Böylele iççe Dini Törelere öğretip ve öğreniyorlardı.



Kurdische Frau mit typischem Kopfschmuck aus der Zeit um die Mitte des 19. Jahrhunderts

- b) Aurupaya geldiklerinden sonra anladılarki, artık eski Dini ve Kültürel kuralların yerine getirilmesi ve kendi gençlerini eğitebilmesi için Dini Kitapların olması gerekir.

- c) Anne ve Babalar genç yaşlarında burda Avrupa ülkelerinde büyümedikleri için, burda büyüyen Gençlik sorunlarından de pek bilgileri olmadığından dolayı, burda doğup ve büyüyen gençlerle iyi anlaşamıyorlar. Artık Anne ve babaların burda büyüyen gençlerine eskiden çok fazla ilgilenmeleri gerekir. Çünkü bu yabancı Memleketlerden dogup ve büyüyen gençler iki Kültür arasında yaşıyorlar. Büyüden de bir çok anlaşmazlıklar ve sorunlar ortaya çıkıyor.

Artık bu sorunların hakkında tek Aileler halinde baş edemiyorlar. bilmeliyizki bu sorunlara karşı ancak toplumsal olarak birlikte ve bilinçli bir şekilde mücadele etmemiz Sartir. İşte Demegimizde bu Amaçla kurulmuştur. Bildiginiz gibi biz demek çalışmalarımızda daha çok Gençlik sorunların üze-

rinde duracağiz. Genç Kardeslerimize tasvîyemiz, eger gerçekten kendi Dinin ve Kültürünü öğrenmek ve öğretmek istiyor saniz, gelin biz hep beraber çalışalım. Birsey biliyorsanız ve başkalarına öğretmek istiyorsanız o halde sizde Yünetim Kuruluna katilin Kültürel ve Dini guruplar, Kurmak istiyorsanız elimizde gelen her yardımı size yapariz. Bütün gayemiz toplum ve Ailede sorunları olan her yezidiye yardımcı olmak, gençlerin Dini ve Kültürel bilgilerini artırmaktır. Ancak bu şekilde birlikte çalışırsak binlerce Yilardan beri olan toplumumuzu ve Dinimizi kuruyabiliriz.

Pêseroj û pêsve birina Ola me giredayî Ciwana ye.

Ciwan çêqas ji Dîne xwêre xwedî derdikevin û Ola xwe çêqas di parezin?

Keç û Xort stûnin civata Êzîdiya yî ferzin. Ku baweriya wan bi Dîne Êzîdiya tûnebe, ewê ji Dîne xwêre xwedî demekevin û wê civata Êzîdiya hênda



Groupa Kanya Sipi

bibe. Ji vê sebebê ye ku dibê çavê me li ser Ciwanen me be, ka Ciwanen me çi difêkirin? Rewşa jiyana Ciwanen me çiyê?

Ku mirov ji Ciwana, li ser rêça dîne Êzîdî pirsekê bi-pirse, mirov pêderdixê ku ew êrf û êdetên xwe nasnakin. Ev tistekî zaf dil êse, rastî serme jî. Gelek caran tê gotin ku Ciwan naxwazin êrf û êdetin xwe nasbikin. Le rastî ne wisaye: Ku şîraniya Civat û Ola wan di dilê wande tînebûna, ne dêçûn govend û dîlanin me xwe hîn nedikirin û bi zimanê xwe xeber nedidan. Têkîltiyê nava wan wê, ne heqas dewlemend buna. Sedemê vê, nezanebunê ewe ku di nava Familê û ci-

vaten mede êsasê Ola me, bi zanebûn ji Ciwananre nayê gotin. Rastî jî, ka di kîjan malê de dêha ji zarokan re tê şrovekirin, an jî ciyê Tauwsf- Melek di Ola me de çiyê?

Malbatê van tîstan dikin zaf kêmin. Lê ev nayê wê maneyê ku em dibejin, Malbatê Êzîdiya rêça dîne Êzîdî bê zarokê xwe nadine naskirin. Lê mixabin (malesef) em bi pêranî li ser qedexê, şînor û gunehin dinava Ola mede disekin. Ji bona ku ev agehdariyen yek alîne, Ciwan Ola me teng dibînin. Ji bo parastina Dîne me, hebûna van gunehan ferze em hercar bibijin. Ji bo Keç û Xorten me ji dîne xwe hezbikin, dibê şîraniya paqij û dewlemendiya kultura dîne Êzîdiya, ji wanre bi delalî bi gotin. Em naxwazin bê van gotinan Dayîk û Bavan niheq bikin, li bê rastî jî, gelek valehiyê gêrîng hene.

Em dibejin, em Êzîdîne û hew. Êdî ev têtê têra Keç û Xorten me nake. Di rewşa irode, ku teknîk û êlim pêşde çûye, lazime em li ser Dîne Êzîdî lêkolana çêbikin, gerek her kes bi rehetî, bê têrs karibe li ser dîne Êzîdî dîtin û fikra xwe bibije. Em Êzîdî ji kurê hatine û dîroka me hetanî kurê dêçê? Em çi karin ji bona Civata Êzîdiya bikin?

Wek un hemû dizanin Êzîdî ji ber tade û niheqiye dev ji welate xwe, welatê bav û kalan berdane û hatine xerîbiyê. Daxwaziya dayîk û bava ne mezin ewbû ku zar û zîçên wan ji nav nêheqî, belengaziye mezin xelaz bêvin, ji bona karibin bê rêhetî di rêça dîne xwede bimesin û jire xwedî derkevin.

Malbatên Êzîdiya dixwazen zarok û zîçên xwe li gorî rêça Dîne xwe mezin bikin. Pêkanîna vê daxwazê di sertên Ewropayê de gelekî zahmete.

a) Li Kurdistanê Êzîdî di Gunda de dinava hevûdin de bûn, lewma jî wî wextî Êzîdîtayî zaf geşbû. Lê mixabin li Ewropa rewş ne wisaye, pêkanîna Êrf û Êdetin dîne Êzîdî weke li Welat ne mûmkûne.

b) Ciwanên me dê nava dîdo Kultura de mezin dibin; Yekjê kultura Almanê û ya didûyan jî kultura Kurdê Êzîdiye. Gelek astengê (problemê) Ciwanen me ji ber vê yekê hene.

c) Ciwan ji xwe di pirsên, em çi ne û em malê kîjan Civatê ne Ferze malbatên Êzîdiya weziyeta ji Ciwanan fahmbikin û bi wanre li ser derd û zahmeten wan bi peyîvin.

Komelê Êzîdiya le Almanya, dixwazin giraniya xwe deynin ser xebata bi Ciwananre, em vî karî wek karê xweyî êsasî dibînen û emê giraniya xwe deynin ser vê xebatê. Imkanen ku mirov bi Ciwanan re bi xebite gelekî, wek nimûne avakirina komeke Folklorê û w.d. Di Komita me ya Serkarîde endamen Ciwan ji hene û ew astengen Keç û Xorten me bas nasdikin.

Em bawerin ku em mêl bidine milê hevûdin, em bê hevre bi tîfaqbin emê karibin gelek xebaten baş bikin û emê di doza xwede serbikevin.

Êdî wext hatiye û derbas jî dibê, lazime em li dîroka xweye kevn xwedî 14 derkevin û baştir nas bikin. Wek un hemû dizanin, mirov bi hevre mirove. Gelê li Dîroka xwe xwedî demekeve wî hendaye.

Yezidiler Arkadas Tiyatrosunu protesto ettiler.

Bremen. Yezidiler derneği, Yezidi dinini aşağılayıcı içeriğe sahip olan tiyatro oyununu durdurabildi.

Köln'de bulunan Arkadaş Tiyatrosu tarafından sergilenen Tiyatro oyununda Musulman bir genç ile Yezidi bir kız arasında geçen aşkı anlatılıyordu. Kêrîvê (türküstüne) hikayasine benzer bir uydurmadan ibaret olan oyun.

14.02.94 tarihinde Bremen Schauburg Sinemasında, Yezidilerin inançları, yaşantıları gelenek ve görenekle-riyle hiç bir ilişkisi olmayan uydurma oyunu oynanırken, Bremen Yezidiler derneğinin yöneticileri oyuna müdahale ederek, hiç kimsenin Yezidiler hakkında topluma asilsiz bilgi aktarmaya hakkı olmadığını söyleyerek, Tiyatro yöneticilerinden oyunu derhal durdurmalarını talep etiler. Tiyatro oyunu bu müdahale yüzünde kısa bir ara kesildi ve daha sonra son perdesine kadar oynandı.

Yezidi dini üzerinde olumsuz imaj yaratan bu Tiyatro oyununu kuran Arkadas tiyatrosuna ve yöneticilerine bir protesto mektubu gönderildi. Bu oyunun derhal

durdurmalarını ve bir daha oynatılmaması için talep edilen mektupta, tiyatro oyununun yöneticileri Yezidininini küçültemek, güllünç duruma koymak ve Yezidilerle hiç bir ilişkisi olmayan asilsiz iddalarda bulunmakla suçlandı. Arkadaş tiyatro gurubunu sert bir dille eleştirilen yazıda oyunun bazı sahnelerinden belirli örnekler verilerek olayın ne denli haksız ve Yezidilerle ilişkisi olmadığı gerçeği dile getirildi.

Bu protesto mektubu üzerine Arkadaş Tiyatrosu başkanı 18.02.94 tarihinde Bremen Yezidiler birliğine bir mektupta gönderdi ve özür dileyerek, Yezidi Dinini kötülemek, küçüktürmek diye bir amaçları olmadığını ve bu oyunu bir daha oynatılmıyacağı sözünü verdi.

Bu oyunun durdurulmasını yezidilerin büyük bir başarısı olarak görüyoruz. Her zaman gerçeklere dayanarak, meselelerin üzerinde durarak en akilci yöntem olarak görüyoruz. Tarihleri boyunca çeşitli hakaretlere uğrayan Yezidilerin Almanyada böyle hakaretlere karşı duyarsız kalmaları beklenemez

Şivan: 'Eger un ji Kirivê heznakin, ezjî ji heznakim.'

Hêvpeyvîn

Hamburg. Serokê Komela Çande û Dîne Êzîdiya li Oldenburgê Telim Tolan, li ser navê Dengê Êzîdiya, dê 06.02.94.de bi Hozan Şivan Perwer re li ser mana sêtrana Kêrîvê peyvî. Em vê hevpeyvîne pêşkêşî Xwandevanên xwe dikin.

Dengê Êzîdiya: Heval Şivan Perwer tê karî je mere bibejî mana vê kélama Kêrîvê çiyê?

Şivan Perwer: Mania vê sêtraneke Kurdiye kevne, klasîke pir delale û xweşe. Alemê ji hezkir. Gava min dest fikir, min dî herkes ji hezdike, dûre di navde ewek heye, Gêrikek heye. Mesela vedike. Mîletê Kurd mesela bingehiyê, â Ekonomîk, â Welat. Têştêkî bi hevêyî. Yanî mumkûne kurd, şêwe şêwe Dîna bawer bikin, Mesheba bawer bikin, lê manfêata gelê Kurd di binde bi hevêye.

Dengê Êzîdiya: Tê zanî mîletê Êzîdî, ji vê Sêtranê hez nake, armanca te ev Kélama gotiye çiyê?

Şivan Perwer: Ez dixwazim gelê Kurd li nav hev keve. Ne lê dûrî hevbe. Armanca min ne meselê Dîn pêş xî, weyahute Dîn şûnde xî, wey yahute nizam çiyê. Her kes ser baweriyê xwe be. Kî bawer dike, bira ber xwe bawer bike. Kî bawer nake, bira bawer neke. Eviya daxwaiyê însanayê.

Eva sitranê Kurdî kélasîk bû, min got. Min bê arman- ceke Xerab ne gotiye. Erê, lê Kes, Siyset û miyasetê viya xirab kar tînin. Tê zanê! Yanî, kî lê hêla min di- çên, di parêzin. Kî naçên, xêra dikin. Bavo, min bê Qestî têtêk ne gotiye. Roniya çavê min. Ez ji gelê

xwe hêzdikim. Dilê kesî bê êşe, ne rêhet bive, ez Sêtra- nekê na xwînim. Evya, ne meseleye. Armanca min, zimanê Kurdî paqêştir, delaltir bêvê.....

Muzîka wî derkeve, Sêtranê wî bê xwandin, yanî tiştên Kurdîstanê nûjen bêvin, yê Kevn werin ber çav. Armanca min eve, ne têtêkî dine. Têştin ku Gelên. min jê acis bive ez na xwînim û ez jî, jê hêznakim. Eger un ji kêrîvê hiznakin, ez ji hisnakim.

Dengê Êzîdiya: Emê van gotinê te, dê D. Êzîdiya de bi nêviştînin. Wekî dinê, jê me çê dixwazî û ji Êzîdiyare têtêkî bibejî heye?

Şivan Perwer: Êzîdî çavin minin. Birayên mene. Em hemûn Kurdin. Ba min ferq nîne, yanî kî Êzîdî ye, Musulma ne, Alevî, Sûnî ye û kî nêzanî çêye. Xelqêq heye, Mîletek heyê, berî her têtêkî Zimanek û Welatekî meyfî bi hevê heye. Em Mîletekin. Lê bawerî yek xwe heye, her kes li ser baweriyê têtête kî dine. Ez wî karî karîş nabim. İşim bê wî Têştî tûneye, Her Der êynî têtête. Te got erê? û ji wanre bibêje, bira Dilê xwe ji min nehilin. Ere, Sêlava li hemiya..!

Dengê Êzîdiya: Zor spas dikin.

Yezidi halkına soruyoruz

1. Bazı yezidi İnsanlarımız vardır, başka insanlar onların Yanlarında İnsanlarını, azarlarken neden seviniyorlar Anlamıyoruz.

2. Bu insanlar Kendi İnançlarına saygı göstermiyorlarsa ve Dinlerine sadık değillerse neden biz bu İnanca tapıyoruz diyorlar. Bana göre, eğer bu Dine inaminiyorlarsada bu Dine taşatma haklaride yoktur. İçinde bulunduğumuz Ülkenin Demokratik ortamında faydalanarak, yezidi Dini hakkında daha fazla bilgileri varsa, özgür ve Demokratik bir şekilde imkanlarını kullanarak amaçlarına kavuşa bilirler.

3. Neden biz bir birmizin dedikodu suna seviniyoruz? Neden bir birmizdan kızkanıyoruz? Neden Dünyadaki insanları gibi Geleceğimizi Düşünmüyoruz? Neden bilenz, bilmiyenimizi bilgilendirmiyor? Neden

Gençlerimizi Dini bilgilendir melerine çaba göstermiyoruz Diyoruzuzki?

Hiç kimsenin inancımıza Engel olmaya haki yoktur inancımıza Ancak biz Sahip çıka biliriz Cenabi Allah demiş. "Sen mücadele edersen, bende seni Muradına Kavuşturirim". Onun için dinimize ve inancımıza Sahip çıkmak bizim görevimizdir ve Başkalardan beklileyemeyiz. Ama bu yazdiklarima rağmen bunuda ihmal etme hakimiz Deyildir. Biz yezidiler ana dilimiz Kurdçedir ve Kürduz onun için "Aslini inkar eden Dinide inkar eder, Dinini inkar eden Aslinide inkar eder" Demisler Tum yezidi Halkini birlik beraberıye Çağırıyoruz birlik, beraberlik ve iyillikle Alahin huzuruna gidilir Allah Kötüyü Sevmez dayima iyiyi sever Alahin Sevgisi üzerinizde olsun Diliyorum.

Mehmet Tolan

Dengê Êzîdiya ji bona Êzîdiya

Gelî xwandevanê Dengê Êzîdiya hêja!

Gelekî sipas ji bona wan Namê we ji mere şandine. Emê çend namê we bi tevayî, di vê hejmara 3. de bi weşnin. Weke me di hejmara D. Êzîdiya 2. de, qelsî û bi mîcaliya xwe ji bona nêvîsandina bi Kurmancî nêvîsandiye, em dîsa jî eşkere di bijin. Tê kes ji me neçûye dêbistana Kurdî ne xwandiye, tê kesî Nêvîskar û Ziman zanê Kurdî mezin di nava mede tûnene. Em li gorîya Mîcalin xwe zidetir zahmet dêdin xwe ,em vê rojnama Dengê Êzîdiya ji bona Çande û Dînê Êzîdî li Ewrûpayê wenda nebe, ji bona Têkîliyê me bi hemû kesê Êzîdîre û dilxwazê dînê Êzîdîre xwertir bine danîn derdixin.

Em hêvîdarin ku unê bi dilekî paqij, li ser Xeletî û Qelsiyê me bi rawestin. Rêxnekirin bê tenê ji bona pêşketina me ne bese, wexta un bi rasatî bixwazin Kêmasî û Çewtiyê me rast bikin, lazime unjî hinekî zahmet bidin xwe û bi mere alîkarî bikin.

Em li bînda pêştgirtiya weye Bêratiyê ne.

Dengê Êzîdiya lê Êzîdiya pîrozbe!

Berî her tiştî ez xebatkarên rojnama Dengê Êzîdiya pîroz dikim, ji xebata wane ya bi Rûmetre serfirazî dixwazim.

Di diroka Dînade (O1) dinê Êzîdiya ye tewri dirokîye. Lê bele heta roja iro Serbixwe nebûye, gelek rûmetên Xweyî Dirokî wenda kirîye. Ez Hevidarim Dengê Êzîdiya wê rupelên dirokê pel bi pel biqellibîne û wê ji nûve navê Mirovatîyê binivîsîne û we Êzîdiya li ser rûkê erdê fedîkar demexîne.

Ji bo Dengê Êzîdiya pêşve here û rêh bigri pêwîste her xwandevanê rojnama Dengê Êzîdiya bi çahrê rexne-darî bixwîne û rexneyên xwe binivîsîne Ez jî dixwazim li ser çend kêmasiyên bisekinim:

1. Di rojanmêde bi Kurdî nivîsandin zaf kême
2. Dîbê Rûpelek ji bo xwandevana hebe.
3. Ji bo buyerên li ser xaka Cîhan ten kirin. Şirovekirina fikir hebe.
4. Bi Navsereyin aliyên Êzîdiya re reportaj bîn kirin.
5. Ji bo Keç û xortên Civan rûpelek vebe û daxwazên wan bîn nivîsandin.

Ez bawerim ger ev madeyên li jor pêkbin, Rojnama Dengê Êzîdiya wê bêtir xwandevana li xwe bicivîne. Ji vî Karîre sebir pêwîste û ez bi dil û can xebata we pîroz dikim û bi serkeftin Gavên nu daxwazdikim. Dema we bimîne Xweş.

Li Oldenburg Eyüp Kurt 1994

Çewa ji însanre Nan û Av Lazime, wisa jî Dinê Êzîdiyare jî Komel û xebat lazime!

Ez Pesin de kêfxweşiya xwe bi derketine Rojnama "Dengê Êzîdiya" nîşan didim û wan hevalê ev karê heja, giranbiha dane ser milê xwe pîroz û sêlav dikim. Bi rastî jî, ev cara yekemîne Rojnameyek weha, ji alê Êzîdiya ji bo Êzîdiya derdikeve. Heger ev Rojnamê û Komelên kû nûh avabune, Jiyanek xwe dûve direj be-dominin. Wê xebateke delal û rênd bi meşnin. Wê cîyê xwe di nav Tarixê de bigirin. Çewa ji însanre Nan û Av Pêwîste, ji bo ku karibe bijî, wisa jî ji Dînê Êzîdiyare pêwîste û hewceye ku Komelên Dînf avabivin.

kirin, ev Dîne me yî Kevin, ev zimanê me yî Zengîn û Şêrn, ev Êrf û Êdetê me yî mêrîn û dêlovan tevê ji deste me hênda bive. Bav û Kalê me bi xwîna xwe, bi can u malê xwe, li Dîn û Kultura xwe xwedî derketin. Ferman li dû Ferman li ser wanve dihat, gundê wan dihatin wêrankirin, xort û mirê wan dihatin kustin, Keç û Jinên wan bi zorê dihatin revandin, mal û milkê wan dihatin talankirin. Lê cardin jî, wan dîn, êrf û êdetê xwe erzan ne dikirin û ji destê xwe berne didan. Lê îro rewş çiyê? îro rêhet rêhet, erzan erzan, tevde ji destê me diçe, piço piço, dê nav destê me de dihele. Em hindik debin, Dîne me hênda dibe. Zimanê me tê ji bîrkirin. Weke mirovekî bêrindar ku bê Doktor û bê derman, hedî hedî dê ber mêrinê ve diçe. Lê belê gavê Şin, an Şahiyê me çidebin, hingê Extîyar û Rûspiye me xeberdanê pir delal dikin. Bahsa çê dikin û çê nakin. Li ser qelena, ser êsîra, ser neyartiyê, ser dîn, ser zewaca qîz û xorta..... Li gava ji Sîne anjî, ji Şahiyê tine malê, her têtî ji bîrdikin. Ji bona halkirina van Problêma tû gavê piraktîk na vêjin. Komelên ku nû avabûne wê ne wisabin. Ez bawerim wexta ev Komel li ser tîstekî xeber bidin, wê li ser wî têtî rawestin. Problemê ku karibin hal bikin wê hal bikin. Ji ber ku di nav Komelade însanê me yî pêkhatî û baş hatine bijartin, ku bi taybetî vî karî bikin. Komîta Serkarî ku ji alê endamên Komelê ve hatine hilbijartin, mecbûre wezîfa xwe li gorîya qewet û îmkane xwe, bi alîkariya endamê Komelê bi cih bîne. Ev endamên hatine hilbijartin, ji bona xebatê bikin, ji bona têfaq û yekîtiya me çê bikin hatine hilbijartin. Însanê li Karîera xwe li nav û Dengê xwe digere. Komelên Êzîdiya ji bo manfiyeta xweye sexsî, an jî Siyasî bi elmîne, armanc û nêta wî ne ji bo Êzîdiya be, zirarê bide Komelên Êzîdiya, hingê pêwîste em qebûl nekin û wan tûj rexne bikin. Xeta û kimasiyê Komelan çê bivin, gereke un bi Bêraî xetayê wan bê bijin, ji bona karibin xetayê xwe rast bikin.

Kê xebatê bike, wê xeta jî bike.

Gereke em kimasiyê piçûk zaf negerînin û mezintir nekin. Komelê me nûh ava bûne, tecrûbê me hindikin, teknîk û îmkane me kimên. Ji bona vê yekê em pêşînde gelekî zahmet bi kêşînin. Pêşîn tîmî zore, li dawî serfiraziye. Rastiye li ber çave, heger em li gorî hoyê ku em li Almaniya tidene, em renegekî rêxistinê di nav Komelade, wehanê Kultur û Dîne xwe ava nekin, her tîstê me yî baş wê hinda bive. Hingê ne Zarok, ne Bav û Kal, ne Dîn û Dîrok me affo nekin.

Bavê Perwîn
(Celle)

Gelî miletê Ezîdî

Ez dixwazim çend kêlîma li ser van Komelên Êzîdîyan ku li Almaniya vebûne ji were bi nêvînim. Belê mirov pêwîst bibîne, rewşa xweyî çend salê beriya vêga bîne bîra xwe. Ez bawerim kesî ji we zemanê 65a heta 80yî ji bîr nekirîye. Wî wextî Cîhan hê xweşbû. Roj li dû Rojê bû, Çav li Çava di gerîya. Mîvan ji mala kim ne-

dibûn, Keç û Xwortê me ji sere Şeveqê hetanî êvarê li ber destê Dê u Bava xwe diçûn û dihatin, hingê guhê me tenê li Mervatî yê bû.

Me sebra xwe li Dênîyayê di anî. Xal, Am u Metik her roj û bi roj li ber çavê me bun. Vêga li pêrs kim bûye. Hevaltî û Mervatî kim bûye! Em tam çavê xwe vekin emê bivînin ku her tîstê me hinda bûne. Gelo ev bela çiyê, bela kîye, ev çi Fermane ji mere hat? Mezin dibejin bela Ewropa ye, piçûk dibejin bela Dayîk û Bavê meye. Her kes tîstekî ji xwere li hev û din tîne. Kes nabêje dewê min têrşe. Di vî wextîde kesê bê sîc tîne, me teva xête kirine.



Piçûk û Mezin:

Edî: Di vî wextîde pêwîste em bi destê hev bigirin, û hevûdin bemedin. Wê zemanekî were ku Êzîdî li vê Cîhanê nemînin. Komelên Êzîdîyan li her derî vebûne û naxwazin ev Têtî were serê me. Daxwazî min eve: Nebêjin ev îş naçe serî, yan ji Komelên Êzîdîyan di bin destê Kurda dene. Bêrinin ka çi xebatê dikin û hija bêjin, ew îş ku un dikin ne bi dilê meye. Nebêjin ew kesê di serî de ji xwe bi îş xwe nezanin. Ev Komelan ji her kesîre vekirîne, un dikarin di roja Ray avîtinê he- rin, Dengê xwe bidine kesê ku kêfa we jire tê û wî bi- xine nava Yönetimê (Komîta Serkar). Li ser vî îşî he- rin û werin, di ser guhê xwere nevejînin. Wexta em li pey vî Şansi neçin, belki carek dinê ev Şensa neyê de- stê me.

Wexta em îro weha ne xebitin, dibe ku di rojeke ne dîrde çend însan bi bîjin: "Hast Du schon gehört, man erzählt sich unsere Vorfahren seien Yaziden gewesen!"

"GELO TE BIHISITÛ. TÊ GOTIN PESIYE ME ÊZIDÎ BUN."

Sermet Dag
(Celle)

Qelen û Zewac

Gelo çima ev dawa qelenê Qîza ji nava me Êzîdiya ranabe, em Qîz û Xortê xwe hin ji bona Markan belangaztir dikin, wana bi Dilê wan na Zewicînin.?

Wexta em li Welatê xwebun, di nav Gunda debun Jiyana me bê Rewseke dinbu û îro em eva serê çend Salan li Ewrûpayê dijîn bê Rewseke dine.

Dema em li Welatê xwebun: Em Êzîdî li Gunda di nava hevûdinde dijiyan, me karibu çitir Çanda xwe biparizin. Her yekê ji me li gohrîya Wezîyeta xwe ê Rênçber, Şevan, Gavan, anjî şuxilkarê Mala xwebu. Ji ber ku em belangaz bun di ser vî halîde jî her serê Mala me bê hindikayî 4 -5 Zarok tide hebu. Kulfetê di malîde teva alîkarî bê hevre dikir, keda xweye bi Salan didane hevûdin, dîsa jî geleka nikaribû ji heqê Qelena derkeve.

Lewmajî gelek kesan mecbûr dibûn herine Rênçberiya bavê Qîzan bikin, an jî herine Derê dinê bi xebitîn, hetanî heqê Qelenê xwe bidane hevûdin. Wî wextî rençberî bi destê hemû kesan ne diket anjî bi her kesî ne dibu. Heger Perê Xortan tûnebû, li Êrdê wan anjî Tiştêkî wanî bi Qedêr hebû, wî wextî bavê Qîzan dest datanîne ser van tiştên Xort. Qelenê qîzê maldaran jî yê Belangazan pirtirbun. Wexta Xortekî Qîzek bi revanda, qelenê wê Qîzê di kete êqsê û Qlenê vê Qîzê jî qlenê Qîzin dinê ziditirbû. Bav û Dayîkê qîzan gelek dilê Xortan eşandîye. Çiqas xort û qîzan jî hevûdin hes bikirina jî, ku Bavê kurik nikaribuna qelen bide, ewan nikaribun bi hevre bi zewicin. Gelek qîz û xortan hin hevûdin ne didîtin, li Bav û Diyên wan bi xwastina gerek bi hevre bi zewicîna. Gera ku Qîz û Xort bi hevre derketina tûnebû. Hinek kesan bi dizî hevûdin didîtin, dilê xwe berdidane hev. Li ser van Dawê qelenade gelek Bûyerê mezin li Welat Çibûne. Ji ber van Qelena me mala hevûdin gelekî xerakirîye, em bune manihê gelek Ciwana ku ne gihîştine hevûdin û ev Nezaniya bûye Sebebek ku em di vanderade derketine.

Wezîyeta meye li Ewrûpayê:

Karkerê me Êzîdiya ewilî di Salan 1965-1967 de hatine Almanya Federal. Pêştî çend salan bi tenê li Almanya xebitîn, dîna xwe danê ku nikarin weha bi tenê Jiyana xwe bidomînin. Încar hatin Kulfetê xwe anîne ba xwe. Heyamek derbasbû Zarokê wan hatine zewacê. Ji ber ku wî wextîde gelek kesin Êzîdî ne hatibun Almanya, nikaribun Zarokê xwe li Almanya bizewicînin, mecbûr di bun de hatine Welat. Încar Markê wan hebun, wexta ev Mark vedigerandine Lîrê Tikî gelek çidibun. Lewmajî her kesî dixwast jî ber timaya Perin pir Qîzê xwe bide kurê Almançiya, anjî ji bona Kurê wan bibuna îşçî, bi Qelenekî pir qîzê Karkerê li Almanya di xebitîn jî kurê xwere dixwastin. Karkerê Almançî jî ber ku qîzê wanî li Almanya di xebitîn û Mark qezenc dikirin, ne dixwastin qîzê xwe bidine kesin ne jî malbatin wan. Lewma hemî karkerin li Almanya di xebitîn qîzê xwe ewilî didane merivin

xweyî Pêş, anî didane Bêrazî, Xwarzî, Kurap, Kurxaltî û Peşmamê xwe.

Wê Demêde dengê Almançiya jî ber ku Markê wan hebun pir xweş derket. Qelen li hevûdin zide kirin, wer bû kesin Fuqare êdî hew dikaribu zarokin xew bizewicîne. Wey li wî qîzê xwe bide Kurê almançiya anjî Qîzê almançiya jî kurê xwere weyne.

Dîsa weke Êdetê li Welat tû kesî daxwaziya Ciwana ne anî ber çava. Bê qerara Xort û Qîza wan bi hevre di zewicandi, ne digotin em Êdî li Ewrûpayine û em di Rewseke dînde. Hesab nedikirin ku rojekê were Xort û Qîzê van tiştin Kevnedar rakin û ê bi serê xwe bivin. Em di van salin dawîde dibinin ku çiqas Ciwan hew bi daxaziya Dê û Bavan dikin û dixwazin bi Dilê xwe Êdî bizewicin. Anjî em nabûn ku zewaca bi Dêl hew dihere serî. Çiqas hêlîne ciwana xera dibin. Ciwan jî Êrf û Êdetê me derdikevin. Hija jî me çavê xwe berdaye Qelena. Gelek caran di Civatê mede ti axaftin û em dixwazin Bîryarekê li ser ku Qelen bine rakirin bistînin. Me gelek caran Soz û Ad daye hevûdin, dîre em li sozê xwe qelibîne. Tifaqa me çinebûye. îro dîsa gelek jî me li ber dilê Zarokê xwe nakevin û em nahilin Ciwanê me bi gîjine hevûdin.

Wexta em bixwazin birastî Qelen jî nava me rabe, gerek em li hêvîya hevûdin nehilin, weke ku hinek Ciwamêra dest pêkirîye, em jî ji berxwede vê Bîryara bistînin. Heger ne emê wi hin Rojin xeraptir bibînin. Kîjan kesê Êzîdî bi xwaze zarokin wî li ser Êrf û Êdetê wî bimîne, gerek jî berxwede Qelena li kesî nebire. Heger ne wehabe tûcar jî têfaqa me çinabe, emê hew karibin jî vêr û pêde Ol û Erkanê xwe jî biparizin.

Weke ku Ciwamêrêkî gotiye: "Meriv jî bo dudo Tiştan hatiye Dinyayê: 1-ji bona Şeref û Namûsê. 2-Ji bona Malê dinyayê.

Kesin ku li Şeref û Namûsê bigere gerek pir ji Malê dinyayê hezneke. Ji ber ku Namûs û malê Dinyayê neyarî hevîn. Kesin jî Malê dinyayê pir hezdike divê pir Bala xwe nede Şeref û Namûsê. Bi vî hawî dikare Malê dinyayê bide hevûdin. Încar bala xwe bidine Jiyane, kesê ku ev herdu Têşt tevde girtine yan digrin, îleh kêmasî di heqê yekî jî van herduwan kirine ku hinek jî herduwan gihandine hevûdin."

Nächste Ausgabe

- Einheitsbestrebungen yezidischer Vereine
- Yezidische Hochzeiten
- Yezidische Religion Teil 3
- und vieles mehr

Protokola Civîna Ciwanin Ezîdiya

Em keç û xortên Êzîdiya dê roja 11. Adarê 1994 cara yekemîn bi pêştgirtiya Komela Çande û Dinê Êzîdiya li Oldenburgê civiyan. Armanca civîna me Keç û Xortên Êzîdiya li ser pîrsa Dinê xwe xeber bêdin û nêrinê (fikir) xwe binin ser ziman.

Me di civîna xwe de van Bîryara sêtandiye:

1. Em ciwan xwe wek berpirsiyarin pêşeroja Dinê Êzîdiya di binin û dixazen mël di mælde ji Dinê xwere xwedî derkevin û pêşde bin.
2. Astengî me yî ku di navbera herdu Kultura yanî kultura Alman û Êzîdiya de hene bi hev re çareser bikin.
3. Eme koma avabikin û têkiliya bi hev re zêde bikin.
4. Em bangî hemû kesin Êzîdî dikin û dixwazen ku ew di vê xebata me daye ber xwe pêştgirtî û alîkariyê bi mere bikin.
5. Em hemû Keç û Xortên ku bêsdarî civîna bûne... pêştgirtî û hevkarîya bi hev re diyar dikin. Bi vî gavî BAWERIYA XWE BI DINE EZÎDIYA RE DIYAR DIKIN.

Welatê min

Ez bi hisreta Welatê xwe yê xemgîn
Ketîme bêriya Gelê xwe yê şêrin,
Bû Kul û Derd dîtina Qamişloka rengin,
Cîwarê Mihamad Şexo, Aram û Cegerxwîn.

Ez jîbîr nakim wê Nêrdehama bin'av,
Ez jîbîr nakim wê Dêrûna dinav,
Ez jîbîr nakim wê Bacina bi Mêray,
Li wir çê dikirin, Helil û Mewj û Xoşav.

Kanî Tilxatûna Ciyê Xort û Qizên ciwan,
Kanî Otilecka ber'av, bi Goristan,
Ka Şelûmî, Melabas û Miherkana,
Bûka Bihara Dirêçik, Tirbîsiya bi Sûk û Dikan.

Gelo heye ez bibinim, Mizgefta bi Gol
Bax û Bîstan kesk û sor û zer lidor
Jîbîr nabe Lalîşa nûrani, ya Qub lidor.

Ez serbilind im bi Bagoka Ciyê Berxwedan
Ez serbilind im bi Dûşayê, Ciyê Bêriyana dilovan,
Ez serbilind im bi Diyarbekira bi Nav û Nişan,
Pêşa dibûn hemû Mîrov, Erd û Ezman.

Dî Dilê min de bûye Kul, Ciyê Kurmênc,
Ew Kîwexa Şikeft asê, bi Kulîlk û Sênc,
Tellêya hînik, Sêwlîtîk û Şekrin, Efsê û Qorix,
ev bûne pênc.

Geliyê Soran, Kûnar û Bîrgurriya ave'derman,
Qelaçê Dasikan, Qûlîka, Kevnas, Dênwank û Koçan,
Liber Çavê minin Bêriyanên Pez didîşan,
Ezê rabim û rûnim û bêjim, ax li min poşman.

Kanî Asinc, Elareşd, Kelhok, Inab û Minminik,
Xêrûbêr û Çemên av'xweş ji wan nêzik,
Nema tê min Dengê Cotar, û Bangdana dik,
Ew Civatên li Xefabiya û Taqan, yê bi Hiqehiq.

Texeri bû, Ciyê Kêf û Şahî û Dilan,
Hemdûna bû Ciyê Feqîr û Qewlbêjan,
Kanî Tolko, ka Kerengo, ka Berzan,
Serêkaniyê, Amûd û Derbêsi û Girşeran,
Silav li we, ji Şewqî yê hejar û xemgiran.

Nuska dîsa biçûme Afrîna bi Dar û Zeytûn,
Di Adarê de em ref bi ref, bi jor ve diçûn,
Ew e Ciyê Şexmendê Fexran wek wî nebûn.

Kî jîbîr dike Şimiz, Hacıir û Zêwa-Mîran,
Qestel, Şamîran û Mezrê naçe ji Bîran,
Ezê her û tim bakim; ji Destan çû Hiznemîran!

Jiyana me

Dîrok Şadê rewş û berxwedanê me
 Wexta îslamî nûh kete Cî û Warê me
 Xerabû Sêtara me û nema Rehetiya me
 Şûrê Şerîetê ranebû ji ser Serê me
 Şêx û Melan vexwarin Xûna Miletê me.
 Began bi hezaran kuştin Jin û Mirê me
 Kevneperestan şewitandin Malê me
 Koledaran nehîştîye vebe Çavê me
 Weha gelek caran çikirine Fermanê me
 Bi zorê ji me sitandin Mekanê me
 Me bi Belengazî parastiye Êrf û Êdetê xwe.
 Bext û wîjdanê Hukumdara tûneye
 Çend caran Dewletan Soz û Ad dane me
 Di peyre dîsa perçiqandine Çanda me
 Bela û Talan kirine Ol û Erkanê me
 Li dîsa jî hîn heye Nav û Dengê me
 Em hijan jî bawerin bi Rêz û Rêzanê xwe

Bavê Şêran